Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1062 | 7-Gulan- 2023 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ nameronahi@gmail.com ☎ 423165

# Kurtedîroka Efrînê

**Biradoșt Mîtanî**

**Bajarê Efrînê bajarekî zengîn e, bi hebûn, civak, Aborî, av û mesolocî bi taybet bi nîşanên ola Êzîdî, şûnwarên dîrokî û hestên Kurdî û netewî.**

Navê Efrînê
ji dîroka kevnar ve navê Efrînê heye, ji ber dîroknasên mezin STRAPON ( 500)B.Z navê APRÎW bi kar aniye, yanî bi KURDÎ (Devera têr ji av a ku jiyanê dafirîne xweş dike, nexasim Efrîn zengîne bi çem û rûbarên AVê).
-Qûnaxên dîrokî:
Efrîn di dîroka serdemên kevirî de cihê mirovê Horaktos 1000000 salî berê, û cihê mirovê Niandirtal e 400000 salî berê, yê ku hestûk û şûnwarên wî di şikefta Duderî de, ji aliyê arkelocê Japonî Takîra Akazawa ve hatin dîtin, li çiyayê Lêlûnê.
Efrîn zemîna şehristaniyê ye ji dema Kurdên XORÎ ve û mîreşîna wan Alalax a li deşta Hemikê ya girêdayî paytexta Xoriyan Orkêşê, li Girê mozan 2500 b.z, û ji dema bavikên me yên Hîtî û Mîtaniyan. Di ser Efrînê re gelek şehristanî derbas bûn, ji wan Aramî, Asûrî, Kaltî (ORARATO), Mîdî, Romen Pêzentes, Parso(FARIS),Yonanî,Romanî, Erebên Misilman,Siloqî û Osmanî.




-Şûnwarên Efrînê :
*Pira Qibarê: Ji çerxê (14) ve ye, ser navê ELÎ QÎBAR e, yê xwediyê sengera Qîbarê ye, ew li bakur û rojavayê gundê Erişqîbar e.
*Kelha nebî HûRî: Ew cihê gora ciwanekî KURD e, navê wî HûRî Henan e, ji Xoriyan e, ew serleşkerekî pêxember Dawid bû (S), di şer de hate kuştin. Piştî SIKENDERÊ MEKDONÎ dema Sûriyê bû para SILOQIS (300 )b.z wî li ser gora wî kelhek çê kir, navê wê ji Horo kire Sîros û di dema Farisan de navê wê bû Koriş. Ew kelih (45) K.M li bakur û rojhilatê Efrînê ye.
*Baregiha dîrokî Êndarê: Ew ji şûnwarên wan dewlet û şehristaniyan e.
*Gundê Xalita yê ji dema kurdên Kaltî ve ye.
* çendî caran sembola Ahoranezda û Xaça Şikestî ya Ariyan li devera Efrînê tên dîtin, li ser dîwarên dîrokî û di binê Erdê de.
-ÊL û malbatên KURD :
Emikan,şikakan,okça êzîdî, com, şêxan, koçer, reşwan, robar, ceqla, hekarî û şerqiyan ...htd.
-Malbat: Elî sîdo mêmê, elî xubarî, derwêş axa şemê meznê êzîdiyan,al cafer,hec omer, bacî reş, reş axa, kor ehmed betal, al emo, al betal, milîdawidî,hesen afendî û dena û gelekin din.
Li Efrînê henek Ermenî jî hene ji dema ku koçber bûn ji Tirkiyê, ji sedema komkujiyan û beşek ji êl û malbatên Ereb jî hene.
-Dîroka siyasî ya Efrînê û herêma wê dirêj û zengîn e, di serdema nû de, di dema dagirkiriya Ferensî de hate parçekirin 1922z di navbera Ferensiyan û Tirkan de.
Ji sala1923z ve Efrînê kete qonaxeke geşepêdaniyê de û kirasê avedaniya nû li xwe kir û pir pêş ket .
-Beriya (5) salan ev bajarê dîrokî û şehrestanî kete singa êrîşên firok û çeteyên Erdogan û Efrîna birîndar dijî wî agirî bihtir ji (60) rojî,bilehingî li ber xwe da, bi saya xwedê û berxwedêrên me YPG,YPJ, QSD, ASAYÎŞ û hemû hêz û gel. Lê mixabin siyaseta heremî û navdewletî û bercewendiyên wan ên nemirovî bi dagirkerên tirk û çeteyên wan re bûne alîkar. Di encama berxwedaniya derdorî 60 rojî de 1500 şehîdên pakrewan canê xwe fedayî ax û gelê xwe kirin û dîrok bi tîpên zêrîn nivîsandin. Biştî şer û pevçûnên dijwar û bi hemû rengên çekan, di nave de çekên keîmyawî jî efrîn ji milê dagirkerên tirk û çeteyên wê ve hate dagirkirin. Efrîniyên ku bi darê zorê ji Efrînê hatin koçberkirin û ev zêdeyî 5 salan e, ku welatiî û niştecihên Efrînê li herêma şehba di hindirê kampan de dijîn û roj bi roj li berxwe didin û hêviya wan a mezin vegera Efrînê ye. Hêviyê gelê Efrînê bi taybet û hêviyên gelê Kurd ew e, ku efrîn di zûtirîn dem de were rizgarkirin û welatiyên Efrînê bi serfirazî vegere ser ax û warê xwe.

# Raz û nihêniya peykerên Mawî



Girava Easter (Paskalya) bi peykerên xwe yên kevir ên ku pirr mezin in tê naskirin. Ev peykerên ku Maoî ji wan re tên gotin bi salan li giravê li ser piyan mane. Wan bi nepenî û serpêhatiya xwe ya veşartî bala hemû xelkên dinyayê bire ser xwe. Di van demên dawî de di nav goleke çikiyayî de peykerekî din ên Maoî hate dîtin. Kifşkirina vî peykerî kir ku lêkoler careke din li ser peykeran bifikirin û li serpêhatiya van peykeran bikolin. Niştecihê bi navê Salvador Atan Hito ku serokê saziyeke niştecihî ye got; "Ev peyker ji bo xelkê Rapa Nuî kifşeke girîng e. Ji lewma haya kesî ji vî peykerî tine bû. Wisa diyare ku bav û kalên me jî hay ji vî pekerê tine bûn."

**Li giravê hezar peykerên Maoî hene**

Girava Paskalya li Emerîkaya Latîn ango Şîlî ye dimîne. Girav di nav behrê de maye û hîna jî lêkoler û arkeolog baş pê nizanin ev peyker çawa hatine çêkirin. Cara ewil Ewrûpiyan di dema kolonîzekirina Emerîkaya Latîn de ev peykêrên Maoî kifşkirin. Destpêkê 887 peykerên Maoî hatin qeydkirin lê li gor texmînan tê gotin ku 1000 peykerên Maoî li giravê hene. Peykerên Maoî pirr mezin in, herî piçûkê wan 3 ton û en mezinên wan jî heta 80 tonî giran in. Hin ji van peykeran heta 10 metre jî bilind in. Ji peykerê herî bilind re "paro" tê gotin. Tê gotin ku peykerê herî herî giran 86 ton e, lê ew temam nebûye. Heger bihata temamkirin dê peyker 21 metre û 270 ton bûya. Guhên peykeran mezin in, her wiha serê wan û bedena wan jî bi heybet in. Poz û çavê wan jî dîsa mezin hatine çêkirin. Zayendê van peykeran jî hene. Ji yên mêr re "Maoî Kavakava" û ji ên jin re jî "Maoî paepae" tê gotin.

**Maoî çawa hatine çêkirin û bi cih kirin?**

Peykerên Maoî ji hêla xelkên niştecih ango Rapa Nuîyan ve Piştî Mîladê di navbera salên 1250 û 1500 de hatine çêkirin. Di sedsala 19'an de hin ji van peykerên ku çik disekînin ketin xwarê. Hin ji wan dîsa hatine rakirin lê hin ji wan hîna jî ketî ne.

Li gorî lêkoleran ji mirov peykerekî Maoî bixeritîne, hilgire û bibe li cihekî bi cih bike divê 23 hezar mirov her roj bixebitin da ku tiştekî wiha pêk were. Dema mirov difikire li giravê 1000 peyker hatine bi cih kirin ev yek meraqa mirovî ya derbarê peykeran de zêdetir dike. Li gel ku di derbarê van peykeran de hin tişt hatine eşkerekirin jî hîna jî hin hûrgiliyên ku nehatine zanîn jî hene. **Yini Ozgur Politika**

Sudoku: Bersiv 71

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 4 | 6 | 8 | 5 | 1 | 3 | 2 | 7 | 9 |
| 2 | 3 | 1 | 7 | 4 | 9 | 5 | 6 | 8 |
| 5 | 7 | 9 | 6 | 2 | 8 | 4 | 1 | 3 |
| 6 | 1 | 7 | 9 | 8 | 2 | 3 | 5 | 4 |
| 8 | 2 | 3 | 1 | 5 | 4 | 7 | 9 | 6 |
| 9 | 5 | 4 | 3 | 7 | 6 | 1 | 8 | 2 |
| 7 | 9 | 2 | 8 | 3 | 5 | 6 | 4 | 1 |
| 3 | 8 | 5 | 4 | 6 | 1 | 9 | 2 | 7 |
| 1 | 4 | 6 | 2 | 9 | 7 | 8 | 3 | 5 |

Sudoku:Pirs 72

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | 5 | | | | 4 | | 2 | 9 |
| | 8 | | | 2 | | 5 | | |
| 4 | | | | 1 | 7 | | | |
| | | | 9 | 8 | | | | 7 |
| 8 | | 3 | | | | 2 | | 4 |
| 9 | | | | 6 | 2 | | | |
| | | | 1 | 7 | | | | 8 |
| | | 8 | | 4 | | | 3 | |
| 5 | 4 | | 3 | | | | 7 | |

## Quncika Têgînan

| | |
|---|---|
| **Endam** | **1.Kesê ji komeke taybet: Endamê Koma Awazên çiya. Endamê partiyê. Endamê malbatê. Endamê gelekî. 2. Parçeyên bedenê: Mînak; çav û dest endam in. 3. Parçeyek ji tevayiya tiştekê.** |
| **Folklor** (Fransî) | Zanista gel, zargotin, çîrok, helbest, stiran û govendên gelêrî. Hunera di nava gel de belav bûyî lê afrînerên wê nayên zanîn. |
| **Komplo** (Fransî) | Plana kesekî yan çend kesan li dijî kesekî, yan komekê, yan dewleteke. |
| **Merasim** (Erebî) | Dêlîndêz, rêûresm, ayîn, resmiyet, seremonî. Civîneke fermî ji bo pîrozkirin yan jî bîranîna kesekî yan bûyerekê: Ji bo bîranîna şehîdan merasimek hat lidarxistin. |
| **Mêtîngeh** | Kolonî, welatê yan devera dagîrkirî. Welatê biyanî tê de serdest in. |
| **Mêtînger** | Kesên mêtîngehan bi rê ve dibin, dagîrker. |
| **Nivîsgeh** | Bûro, ofîs, daîre, dezgeh: Em çûn nîvîsgeha kirîna xaniyan. |
| **Pirtûk** | Komek perên kaxizan yên binivîs yan biwêne yên di nava du bergan de hatîn çapkirin. Kitêb. |
| **Proje** (Fransî) | 1.Karekî diyarkirî yê ku piştî çend qonaxan diqede: Rêveberiyê ji bo bêkaran projeyek amade kiriye. 2. Plan, progrem, bername, amadekarî. Ti kes nizane ka plan û projeyên wî çi ne. |
| **Şermezar Şermezarkirin** | Şermezar: Kesên ketîn şermê, kesên ji ber kêmayiyên xwe şerm dikin: Ji ber ku bavê min dît ez cigareyê dikişînim, ez şermezar bûm. Şermezarkirin: Diyarkirina qebûlnekirina gotin yan kiryara kesekî yan hêzekê. Rûreşkirin: Welatiyan kuştina jinan şermezar kir. |



## Dîrokeke Nû Ya Têkoşîna Jinan Tê Nivîsandin

Serhildana jinan li Îranê destnîşana nivîsandina dîrokeke nû ya têkoşînê ye. Girêdayî xwepêşandanên ku ev zêdeyî 7 mehane ku li rojhilatê kurdistanê bi pêşengiya jinan û bi duruşmeya "jin jiyan azadî" roj bi roj pêşdikeve. Mamoste û xwendekarên Zanîngeha Rojava anîn ziman ku kuştina Jîna Emînî ji bona tavahî jinan bû çavkaniya hêz û biryara tekoşînê ye. R-2

## Li hemberî vîna gel êrîş û dorpêç berdewam in



Ji 5 salan ve kiryarên dagirkriya Tirkiyê û dorpêça hikumeta Şamê li ser koçberên Efrînê li herêma Şehbayê nehatine rawestandin, armanca wan ji van polîtîkeyên derveyî pîvanîn mirovahiyê ew e ku îradeya berxwedanê ya gel têk bibin.R-5


Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1062 | 7-Gulan- 2023 | www.ronahi.net/ku/

# SERKEFTINA ÇEPÊN KESK SERKEFTINA GELAN E

Bi nêzîkbûna hilbijartinên 14'ê Gulanê re li dijî Kurdan û muxalîfan zext û zordarî zêde bûne. Bêguman sedemek viya heye, ew jî encamên rapirsiyan in. AKPê ketiye nava tirs û xofê."Desthilatdariya AKP-MHP'ê li dijî her kesî dijminatiyê daye destpêkirin. Wê ev lîstok û dijminatî di 14'ê Gulanê de bi dawî bibe û were xerakirin. R.3




## Şerê Gelê Şoreşgerî



Di pêvajoya heyî de, gelên Rojhilata Navîn û bi taybet gelên Kurdistanê di xeteriyeke mezin re derbas dibin. Hêzên desthilatdar ji bo parastina desthiltdariya xwe, planên qirkirina gelan pêş dixin. Li hemberî wê û ji bo têkbirina planên desthilatdaran, çareya yekê Şerê gelê Şoreşgerî ye.R-4

## Hunergeha Welat afrînera hunera bedew e



Hunergeha Welat ji encama keda Şehîd Welat ya destpêkê ye, afrîneriya hunerî ya bedew dixe nava berhemên xwe de, da ku deng û rengekî xweş û estetîk ji civka xwe re pêşkêş bike.R-7

## Zanîngeha Rojava Festîvala Biharê ya 1'ê li dar xist



Zanîngeha Rojava li bajarê Qamişlo yekemîn Festîvala Buharê bi beşdariya xwendekarên zanîngehê, li dar xist. Festîval 3'ê rojan dewam kir, tê de ji bo xwendekaran pêşbirk hatin lidar xistin û xwendekarên serkeftî hatin xelatkirin.R-6


Gelo R.Erdogan direve?
Ahmet AKTAŞ R-4


Hilbijartin û oldar
Hafiz Ahmet R-6


Niştimanperwerî, Piştgiriya Deklarasyona Rêveberiya Xweser E
Idrîs Henan R-5

# Dîrokeke Nû Ya Têkoşîna Jinan Tê Nivîsandin

Serhildana jinan li Îranê destnîşana nivîsandina dîrokeke nû ya têkoşînê ye. Girêdayî xwepêşandanên ku ev zêdeyî 7 mehane ku li rojhilatê kurdistanê bi pêşengiya jinan û bi duruşmeya "jin jiyan azadî" roj bi roj pêşdikeve. Mamoste û xwendekarên Zanîngeha Rojava anîn ziman ku kuştina Jîna Emînî ji bona tavahî jinan bû çavkaniya hêz û biryara tekoşînê ye.

**Zana Roj/ Qamişlo**

Serhidana ku bi qetilkirina jina ciwan ya Kurd Jîna Emînî beriya 7 mehan hatiye destpêkirin, derbasî asta navnetewî bûye. Dengê jina azad û bi dirûşmeya "Jin Jiyan azadî" li çar aliyên cîhanê dengvedaye. Jinên Kurd û Faris li hember desthilatdariya sîstema faşîst a Îranê serî rakirin. Rûxmî ku tavahî cureyên binpêkirin, îşkencekirin û qetilkirinê li ser wan tê meşandin, lê belê jinan êdî li hember sîstema Îranê biryara serînetewandinê daye. Li ser vî esasî di sedsala 21' emîn de yekem care ku di dîroka dewleta Îranê de, ku nekariye serhildaneke bi pêşengtiya jinan bi bin bixîn e.

Têkildarî serhildana jinan li Îran



û Rojhilatê Kurdistanê, her wiha derbarê girtin û binçavkirina mamoste û xwendekaran, mamosteya zanîngeha Rojava Jiyan Silo û xwendekar Bêrîvan Yûnis ji rojnameya me re axivîn.

Mamoste Jiyan Silo da zanîn ku dewleta Îranê bi mejiyê îslamiyetê desthilatdariyê dide ferzkirin û wiha destpêkir: "Rejîma Îranê ya



ku xwe weke dewleteke Îslamî dide raberkirin, di bin navê vê yekê de civak bi temamî xistiye bin serweriya xwe de. Bi taybet ji bo jinan desthilatdariyeke dogmatîk di bin hişmendiya Îslamiyetê de dide meşandin. Her weha ji zarokê 7 salî heyanî jina 70 salî di nava sîstema desthilatdar de, her tim rastî gef, binçavkirin û kuştê tên. Êdî ji jinê re derfeta jiyanê û nefes girtinê nehiştiye."

**"Roj bi roj dengê azadiyê bilind dibe"**

Jiyan da xuyakirin ku zilim û zordariya bê sînor li ser jin û civakê tê meşandin. Qetilkirina jîna Emînî nimûna herî ber bi çav ya vê zihniyetê ye. Her weha Jîna Emînî bû nûnera berxwedan û tekoşîna azadiya jina kurd û jinên cîhanê û wiha domand: "Dewleta Îranê di bin nav û hincetên li gorî xwe, jina Kurd Jîna Emînî ji ber xuyakirina çend tayên Pora wê, bi rengekî hovane qetilkir û qetilkirina Jîna Emînî bû sedem ku bi deh hezaran jin dakevin kolanan û hovîtiya sîstema Îranê û kiryarên wê yên dij mirovî şermezar û riswa bikin. Jîna Emînî bû sembola berxwedanê, di serî de ji bona jina kurd û tevahî jinên cîhanê.

**"Di oxira azadiyê de jina kurd bûye sembola berxwedanê"**

Xwendekara fakolteya zanista siyasî Birîvan Yûnis destnîşan kir ku li hember hikumeta Îranê jinên xwendekar bê deng namînin û wiha got: "Di pêvajoya serhildanê de tavahî jinên cîhanê bi duruşmeya "Jin Jiyan Azadî" xwepêşandan lidarxistin. Bi taybet jinên xwendekar yên zanîngehan li beramber siyaseta dewletê daketin qadan û dest bi çalakiyên mezin kirin. Li her derê û bê tirs serî rakirin û bûn mînakên jinên tekoşer. Ji bo tepisandina van çalakiyan hikumeta Îranê tavahî cureyên binpêkirinê bi kar tîne, bi hezaran jin hatine binçavkirin û hîn jî çarenûsa wan ne diyar e. Her wiha bi sedan jin hatin îşkencekirin, kuştin û jehrkirin. Di sedsala 21 mîn de zagona darvekirinê tenê di Îranê de tê meşandin û di oxira vê serhildanê de bi dehan jin hatine darvekirin."

**`Şoreşa Rojava ji tavahî jinan re bû çavkaniya hêz û baweriyê`**

Bêrîvan Yûnis anî ziman ku şoreşa jinên rojava bû vejîn û îlhama azadiyê ji bona tavahî jinên cîhanê û wiha got: "Şoreşa rojavayê Kurdistanê ji bo tevahî gelên cîhanê bû mînaka azadî û wekheviyê. Jina Kurd bi keseyeta xwe ya têkoşer li hember guhartina zihniyeta desthilat têkoşîneke pîroz dide meşandin û xwe îsbat kirî ye. Şerkirina jina kurd ji bo doza azadiya xwe ya ku bi îdeolojiya Rêber Ocalan hatiye afirandin bû hêz ji bo tavahî jinên bindest. Li ser vî bingehî îro duruşmeya "Jin Jiyan Azadî" bû siloganeke nevnetewî.

**`Jina kurd bû sembola tevahî jinên cîhanê `**



Xwendekara zanîngeha Rojava Bêrîvan Yûnis di dawiya axaftina xwe de ragihand ku riya zanist, xwebûyîn û azadiyê pêwîste ku bê navber were meşandin. Her wiha tekez kir ku ewê her tim piştgiriya vê serhildanê bikin û got: Bi tekoşîn û vîneke herî xurt li hember tavahî astengiyan divê, jin ji bo heqîqet û lêgerîna azadiyê berdêlên herî giran deyîne li ber çavan bigre û vê riyê tacîdar bike. Êdî jinên cîhanê û bi saya pêşngtiya jina kurd, ji bona azadiya xwe bê dorveger serî rakirine û mafê xwe dixwazin . Em jî weke jinên Rojava ji tavahî cîhanê re radigihînin ku ji bo serketina serhiladanên jinan li ku dibe bila bibe emê bibin hêza piştgiriyê ya herî xurt. Her weha em ê, bi hev re ji bo avakirina civakeke wekhev û bi adalet li hember guhartina hişmendiyê tekoşînê bikin.

# Ji Çiya heta Xemlîn

Nehîr Pale

Ji êla Kêtikan û babikê Almamed malbata Şahîn welatparêz û xwediyê dozê ne, di destpêka salên 80`ê de Tevgera Azadiyê dinasin. Ew ji gundê Bilik ê başûrê Kobanê ne. Di hemû pêvajoyan de bi Tevgera Azadiyê re bûne dost û hevrê. Di salên 90`î de êdî keç û xortên wan tevlî Tevgerê dibin, di wextê hatiye xwestin li çiyayên Kurdistanê têkoşîn kirine, berê xwe dane şoreşa Rojava û li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê jî li hemberî çeteyên DAIŞ`ê şer kirine. Ji bo doza rizgarkirina Kurdistanê xwêdan dane û bûne xwedî şehîd û şoreşgeran.

**Jin pêşengtî dike**

Şehîd Xemlîn sala 1994`an ji civaka Kobanê ku sîstema wan êlin û di mijara jinê de girtî ne, beşdarî Tevgera Azadiyê dibe. Pey wê re bi dehan keç û xort ji heman malbatê riya wê dişopîn in. Hinek ji wan berî şoreşa Rojava û hinek jî bi şoreşa Rojava re tevlî dibin.

**Hejmara şehîdan dighîje 33`ê şehîdî**

Ji nava keç û xortên malbata Şahîn destpêkê rêheval Çiya Kobanê (Eh-



med Şahîn) li çiyayên Kurdistanê şehîd dibe. Piştre gelek keç û xortên malbatê çeka wî radikin û rêça wî dişopînin. Hinek ji wan li çiyayên Kurdistanê, hinek li Rojava û hinek jî li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê şehîd dibin. Hevala Xemlîn Kobanê ku ji keç û xortan ya yekemîn tevlî Tevgera Azadiyê bibû roja 3`ê Gulanê 2023`an li herêma Dêra Zorê şehîd bû.

**Kurta jiyana Şehîd Xemlîn Kobanê**

Şoreşgera jin Emîra Salih Şahîn sala 1980`an li gundê Bilik ê kantona Kobanê tê dinê. Sala 1994`an tevlî Tevgera Azadiyê dibe û derbasî Akademiya Masûm Korkmaz dibe. Rêber APO dema ku wê dibîne navê Xemlîn lê dike û nêzî salekê li gel Rêber APO dimîne.

Têkoşîna Heval Xemlîn bi Akademiya Masûm Korkmaz dest pê dike, berê xwe dide çiyayên Kurdistanê, sala 2014`an tevlî berxwedaniya Kobanê dibe û di şer de gelekî giran birîndar dibe, hîna tedawiya xwe bi dawî nebûye sala 2018`an tevlî şerê Efrînê dibe.

Birînên hevala Xemlîn ku di encama şer de çêbibûn çareserî ji wan re nebû, ji ber hemû parçeyên fîşek û bombeyan bûn. Birîn, nexweşî û zehmetî li pêşiya wê nedibûn asteng her dixwest li cî û herêmên zor û zehmet bixebitê.

Sala 2018`an tevlî Hemleya Ba-



gera Cizîrê dibe û fermandariya şerê li hemberî çeteyên DAIŞ`ê dike. Heyanî ku çeteyên DAIŞ`ê ji xaka Sûriyeyê hatin derxistin û Baxoz ji wan rizgar bû, hevala Xemlîn di hemleya Bagera Cizîrê de fermandartî dikir.

Şehîd Xemlîn sala 2022`an ji aliyê ewlehiyê ve berpirsyartiya Asayîşa herêma Dêra Zorê rakir. Di hemû pirsgirêkên ewlehî, cinsiyetparêzî û civakî ve berpirsyartî rakiribû. Bi riya xebatên rêxistinî û perwerdeyî hewl dida ku jin bibe xwedî rol û misyon. Ji bo li Dêra Zorê jin tevlî hêzên Asayîşê bibin gelekî têkoşîn kir û li ber xwe da. Bi keda wê û jinên derdora wê hejmara jin li Asayîşa Dêra Zorê gihîşte 55 jinan. Niha jin di hemû Nivîsgehên Ewlekariya Hundirîn û hêzên Operasyonê ciyê xwe digrin.

Malbata Şahîn bi şehîdên xwe serbilind in. Birayê Şehîd Xemlîn Şahîn di merasîmê de axivî û şehadeta hemû şehîdên malbatê li welat pîroz kir, şopandina riya wan anî ziman û got ew ê hemû ji bo parastina xaka welat, têbikoş in.



# Hunergeha Welat afrînera hunera bedew e

Hunergeha Welat ji encama keda Şehîd Welat ya destpêkê ye, afrîneriya hunerî ya bedew dixe nava berhemên xwe de, da ku deng û rengekî xweş û estetîk ji civka xwe re pêşkêş bike

**Hemze Sêvo/Qamişlo**

Bi destpêkirina Şoreşa Rojava re, êdî li Rojavayê Kurdistanê û herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê pêşveçûnek kete nav hemû aliyên civakî, hunerî û hwd… Hunergeha Welat jî yek ji gavên pêşîn yên pêşketina hunerî li ser asta Rojava bû û ew bi xwe saziyeke hunerî û çandî ku di bin sîwana Tevgera Mezobotamiya ya Çand û Hunera Demukratîk de kar dike. Hunergeh bi pêşengtiya Şehîd Welat û hin hevalên wî, di sala 2014`an de, li bajarê Qamişlo hate sazkirin. Herwiha şehîd Welat di Şoreşa Rojava de, xebatkar û afrînerek bû ku bi saya wî hunergehek hat sazkirin.

Di wê demê de,hunergeh jî ji maleke gelêrî pêk dihat ango ne saziyeke taybet bû, Welat ….. û çend hevalên xwe bi derfetine kêm, tomargehek di nav wê malê de saz kirbûn û karê xwe yê tomarkirin û berhemdayîna muzîk û stranan berdewam dikirin.

Di destpêkê de Şehîd Welat û hevalên xwe li ser tomarkirina mozîk, sitran û karên hunerî, heya sala 2015`an xebatên mezin kirine, lê di sala 2015`an de Welat bi teqîneke terorî li navçeya Tirbespiyê gihaşt asta şehadetê, lewma weke qedrdayînekê ev



hunergeh bi navê Hunergeha Şehîd Welat û li ser navê wî ji aliyê Desteya Çand û Hunerê ve hat damezrandin. Kar û xebatên hunrgehê bi şehadeta Welat ranewestiyan, lê belê rêhevalên wî dan ser şopa Welat, erk û karên hunergehê avêtin ser milên xwe.

Di Hunergeha Welat de sîstema teknîkî, ji sîstemên pêşketî ye, amûrên muzîkî û amûrên tomarkirina deng û muzîkê jî, pêşketîn e. Herwiha di hunergehê d kesên bispor cihê xwe digirin û berhemên xweş û balkêş pêşkêş dikin. Hêjayî gotinê ye ku Hunergeha Welat ji sala 2022`yan ve heya niha 33 berhem tomarkirin û li ser toreyên mediya ya civakî hatine belavkirin. Ji berhemên wê yên herî balkêş jî, sitrana Şervano, Hur Ena ango Ez Azad im, Nazê Nêrgiza Hewşê, Elhan Mensiya ango Awazên Windayî ne û sitrana herî dawî , Li Herî Jorî ye Ku van berheman dengvedanek di nav civakê de veda û hêjayî gotinê ye ku li gor Sziyeke çand û hunrê ya cîhanî ku nirxandina sitranan li ser asta cîhanê dike, Strana Şervano asta 3`yan piştî Sitrana Katiyoşa û Çaw Pêlla weke strana herî bandor li cîhanê bi giştî kirbû, birye.

Di warê pêşveçûna weşanî de ya li ser toreyên mediya ya civakî jî, di dema niha de 152 hezar şopîner li ser You Tubê kenala Hunergeha Welat dişopînin.

Berê navenda Hunergeha Welat xwedî yek istodyoyekê bû û tenê li Qamişlo bû, heya sala 2022`an jî hemû berhemên xwe di riya istodiyoyekê tenê çêdikir. Îsal hunergehê di aliyê istîdyoyan de gavên nû li ser asta bakur û rojhilatê Sûriyê avêtin û şaxên xwe berfireh kir.

Hêjayî gotinê ye ku Hunergeha Welat istodiyo li Kobanê,Tebqa,Minbic û Şehbayê jî vekirin û perwerdeya deng û reng ya herî pêşketî dide endaman. Herwiha Tevgera Mezobotamiya ya Çand û Hunera ya Demokratîk niha jî hewldana xwe û avakirina saziyeke mîna saziya Hunergeha Welat li ser asta bakur û rojhilatê Sûriyê dike û wê di dema pêş de li bajarê Reqayê were avakirin û herwiha wê nûnertiya hemû pêkhateyan bike.

Di derbarê kar û xebatên Hunergeha Welat de, endamê istodiyoya hununergehê Bêkes Darî ji me re axivî

**'Hunergeha Welat afrîneriya hunerî dike '**

Bêkes Darî di destpêka axaftina xwe de, da zanîn ku berhemên vê hunergehê tev bi wate ne û hûrgilî û kêliyên xweş yên hunerî vedibêje û wiha got: "Ev hunergeh di Rojava û herêmên bakur û rojhilatê



Sûriyê de, tevlî 25 endamên xwe yên bispor hertim ji civaka xwe re hewl dide ku berhemên bi nirx, estetîk û watedar çêdike. Armanc jê vê yekê jî pêşkêşkirina afrîneriya hunerî ya ku hertim bala civaka xwe bi hûrgiliyên van berhemên hunerî bikşîne, herwiha ev yek dûrî berjewndiyên madî û şuhreta takekesî ye. Ev kar û xebatên ku em dikin bi saya xebatên destpêkê yên sitûnî û yên serdema me ya niha ne, bi saya Şehîd Welat û herkesên bispor yên ku bê beramber destekdayîn dan Hunergeha Welat, endamên henergehê perwerde kirin û di wrê hunerê de ew pêş xistin. Herwiha di dema niha de, xebata me êdî berdewam e, niha jî em hewl didin ku berhemên bêhempa biafrînin, Hunergeha Welat li ser çend berhemên bi nirx dixebite û yek ji wan jî girêdayî dîroka jinê ye û wê di demeke nêz de wê were çêkirin."

# Nûrhîn Hisên: Ez bi firçe û rengan ronahiyê didim hunera Kurdî


Norşîn Sîno\Qamişlo

**Wênesaza ciwan Nûrhîn Hisên diyar kir ku wê bi firçe û rengan xwest ku ronahiyê bide hunera Kurdî, herwiha destnîşan kir ku piraniya tabloyên wê li ser jinên kedkarin.**

Her mirovek di zaroktiya xwe de xewnek wî heye ,kesê ku li hemberî astengiyan xwe bê hêz bibîne, tiştekî bi ser naxe û nikare xwestekên xwe pêk bîne. Ciwan kurd Nûrhîn Hisên jî, xewnek wê hebû, tevî astengiyan jî Norhînê ji bo ku bigihêje xeyala xwe li hemberî hemû zehmetiyan li ber xwe da û dest ji xwesteka xwe ya wênesaziyê berneda. Herwiha ji bo ku bighêje armanca xwe, kedek mezin da.

**`Min bi firçeya xwe li hemberî hemû êrîşên li ser xeyala xwe li ber xwe da'**

Wênesaza ciwan Nûrhîn Hisên ya ji bajarê Serê Kaniyê diyar kir ku wê li hember hemû astengiyan li ber xwe da û wiha axivî : "Di destpêka her gavek nû di jiyana



mirov de, astengiyên pir mezin wek ezmûnekê tê pêşiya wî , ez jî yek ji van mirovan ku xeyalek min hebû ku ez bibn wênesaz. Lê gelek astengî ji min re dibûn sînor ku ez ji wênesaziyê dûr bibkevim. Lê tevî vê jî min firçeya xwe kir çeka li hember hemû êrîşên li ser xeyala xwe û min şer kir, niha jî ez gihiştime asteke pir cuda ji destpêka ku min dest bi wênesaziyê kir."

**`Bi firçe û rengên xwe min xwest ku ronahiyê bidim hunera kurdî`**

Nûrhîn dazanîn ku wê bi firçe û rengên xwe xwest ku ronahiyê bide hunera Kurd û wiha axaftina xwe dewam kir: "Min helbijart ku bi rengekî din bixebitim û min xwest bi firçe û rengên xwe ronahiyê bidim hunera Kurdî, bi taybet min xwest ku ez wêneyên hunermend, rewşenbîr û kesayetên kurd yên ku bandor li hunera kurdî kirin e ,xêz bikim. Nemaze yên ku xwedî li ser sehneya kurdî şopeke wan ya taybet heye û bi helbest û awazên xwe, mûzîkên kurdî afirandine. Min dît ku ji erkê mine ez van karakteran ronî bikim, da ku ez bihêlim pêşî ew ji bîr nebin. Hêzên ku li ser vê erdnîgariyê serwer bûn, herdem li hemberî çand û hebûna gelê kurd siyasetên çewsandinê dimeşandin, min jî xwest bi wênesaziya xwe ji van siyasetan re bibim bersiv."

**`Piraniya tabloyên min li ser jinên kedkarin`**

Nûrhîn destnîşan kir ku piraniya tabloyên wê li ser jinên kedkar yên hem di şoreşê de hem jî di jiyana xwe de ked dane û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Piraniya tabloyên min li ser jinan e , jinên



kedkar , dayik , YPJ û hemû jinên di jiyana xwe de ked dane ne .Herwiha ez tevlî 20 pêşengehên wênesaziyê yên jinê herwiha yên bi giştî bûme, ez hîn jî daxwazim ku tevlî pêşengehên chanî bibim û xwe pêş bixim."

**`Xwedîderketina li şaristanî û parastina civakê ji erkê her jinekê ye'**

Wênsaza ciwan Nûrhîn Hisên bang li jinên xwedî jêhatiyên cûda kir ku xwedî li hebûna civaka xwe derkevin û axaftina xwew wiha qedand: "Banga min ji bo tevahiya jinan ku xwedî li jêhatiyên xwe derkevin , herwiha ji bo parastina hebûna civaka xwe li ber xwe bidin û xwe pêş bixin. Ji bo ku xewn bibe rastî berxwedan pêwîst e. Herwiha pêwîste ku em kar Heta ku em enerjiyên bê feyde derxînin û di civakê de wekhevî û pêkvejiyanê pêk bînin. Ji bo xwedîderketina li şaristaniyan û parastina hebûna civaka xwe, xistina civakê li ser rêya rast pêwîste."

# Zanîngeha Rojava Festîvala Biharê ya 1'ê li dar xist

**Zanîngeha Rojava li bajarê Qamişlo yekemîn Festîvala Buharê bi beşdariya xwendekarên zanîngehê, li dar xist. Festîval 3'ê rojan dewam kir, tê de ji bo xwendekaran pêşbirk hatin lidar xistin û xwendekarên serkeftî hatin xelatkirin.**

Bi armnaca kêfxweşkirina xwendekarên Zanîngeha Rojava, Zanîngeha Rojava di 3'ê Gulanê de ji bo xwendekaran Festîvala Buharê li dar xist. Festîval 3'ê rojan dewam kir û tê de gelek çalakiyên curbicur bi amadebûna, xwendekarên zanîngehê, rêveberî, mamosteyên zanîngehê û hejmarek ji malbatên xwendekarên zanîngehê, hatin lidar xistin.

Derbarê festîvalê de endamê Komîteya Amedakar A Festîvalê Ehmed Ibrahîm da xwiyakirin ku ev yekem festîval bi vî rengî ji aliyê Zanîngeha Rojava ve tê lidarxistin û her sal wê wek vê rojê, festîvala biharê bê lidarxistin.

Ehmed Ibrahîm derbarê çalakiyên festîvalê wiha got: "Di roja yekem ji festîvalê de 2 çalakî hatin lidarxistin, çalakî jî pêşbirkên werzişî yên di navbera xwendekaran de, herwiha pêşbirka pirsên curbecur ên çandî, werzîşî, dîrokî û zanistî.Di roja duyem de jî, ji aliyê xwendekaran ve çalakiya stran û helbestê hate lidarxistin. Di roja sêyem de pêşbirka baştirîn xwarinê hat lidar xistin, tê de xwendekaran lîsteyek ji cureyên xwarinên ku amade dikin bihvre çêkrin û her wiha rêveberiya zanîngehê amûrên pêwîst ji bo çêkirina xwarinê ji xwendekaran amade kirin."

Ehmed wiha berdewamî da axaftina xwe û got: "Ji bo çavdêriya çalakiyên xwendekaran Komîteyek çavdêriyê hat amadekirin, vê komîteyê xelat li xwendekaran belav kir. Herwiha ji aliyê rêveberiya zanîngehê ve, ji bo serdana odeyên niştecihbûna xwendekarên û şopandina rewşa paqijiyê komîteke hat amadekirin û wê xelat bên belavkirin."

Xwendakara bi navê CÎlan Cuma ku ji bajarê Efrînê ye û beşdarî pêşbirka xwarinçêkirinê bû ji mke re axivî û got: "Ez tevlî festîvalê bûm, ji bo ku ez rêbaz û tama xwarinên xwe yên ku herêma Efrînê bi wan navdare, nîşanî hevalên xwe yên li herêma Cezîrê û Kobanê bidim, her wiha pêşkêşkirina çand û kevinaşopiyên Efrînê ji bo tevahiya xwendekarên zanîngehê. Min tenê xwest li vir beşdar bibim û xwarinekê pîşkêş bikim, xwarina ku ez pê, beşdarî pêşbirkê bûm jî, Kufte û Şîş berek bû. Ji ber ku ev xwarinên navdar li Efrînê ne. Ji bo hemû beşdaran re ez serkeftinê dixwazim."





Cîlan Cuma axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Ev festîval gaveke girîng û fikreke hêja bû, ku enerjiya me bilind kir, her wiha ev fisîval kêf û şahî ava kir, di heman demê de heycana me ji xwendinê re zêdetir bibe."

Di roja dawî ya festîvalê de, piştî ku pêşbirka xwarinçêkirinê hat bidawîkirin, navê xwendekarên ku di çalakiyên festîvalê yên cûda de bi ser ketin hat eşkere kirin û xelat li wan hat belavkirin.

Serketiyên yekem ên pêşbirkên lîstikê ev in:

1- Ehmed Mihemed, 2- Xalid Ebdî, 3- Siyamend Elmasto, 4- Nofa Mîro, 5- Hemûd Reşo.

Ji aliyê paqijî û birêkûpêkiya odeyên xewgehên xwendekaran ve, navên xwendekarên serkeftî wiha ne:

1- Emîra Mihemed Ehmed, 2- Rîma Ehmed Sîdî, 3- Roksan Ehmed Sîdî, 4- Hemrîn Elî Osê.

Serkeftiyên

Serkeftiyên Xewgeha Suryaniyan:

1- Cenda Sibhî Mela Xelîl, 2- Hind Hec Mehmud Dale, 3- Wetha Mehmûd Elî, 4- Sîdra Eladîn Xelîl, 5- Darsîn Mehmûd Elî.

Serkeftiyên Xewgeha Hesekê ya xwendekarên mêr:

1- Ehmed Ibrahîm, 2- Ebdullah Xelîl Ehmed,3- Dilyar Siyamend Omer.

Serkeftiyên Xewgeha Hesekê ya xwendekarên jin:

1- Wetiha Eniz, 2- Eylem Silêman.

Serkeftiyên Xewgiha Rimêlan yên xortan:

1- Enwer Mihemed, 2- Hemûda Ebdî, 3- Mehmûd Ehmed, 4- Ednan Ebdulrezaq Derwîş.

Serkeftiyên Xewgeha Rimêlan ya Keçan:



1- Viyolît Şakir, 2- Bêrîtan Mehmûd, 3- Hêlîn Îbrahîm.

Xewgiha Mesarif:

1- Mihemed Selû

2- Cûdî Omer,3- Alend Hesen, 4- Ebdulkerîm Hesen.

Serkeftiyên Xewgiha Hîmo:

1- Ehmed genco, 2- Ezîz Şêxo,3- Firzit Yasîn, 4- Ocalan Mihemed.

Serkeftiyên pêşbirka muzîk û helbestê de jî wiha bû:

1- Alan Elelî, 2- Hêlîn Hesen, 3- Şêrîn Omer, 4- Beşar Hobo.

Xelata xwarina herî baş ji aliyê tam, şikil û paqijiyê ve jî wiha bû:

1- Tîma 9`an, 2- Tîma 8` an , 3- Tîma 4`an.

# Sebzeyên baxçeyên sergirtî li sûkan in

**Piştî ku cotkarên herêmê û kooperatîfên çandiniyê sebzeyên baxçeyên sergirtî derxistin sûkên herêmê, buhayên sebzeyan gelekî daketin.**



Li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê çandinî yek ji stûnên aboriya civakî ye. Ji ber têkçûna lîreya sûriyeyî û bilindbûna buhayê sebzeyên ku ji derve tên, gelek cotkara û kooperatîfên çandiniyê berê xwe dan çandina wan sebzeyan da ku rêgeza xwetêrkirinekê ava bikin.

Di dawiya meha Sibatê de cotkar dest bi çandina sebzeyên wek firingî, xiyar, kundir, bacan û bazêlayê yên di nav baxçeyên sergirtî de dikin. Di dawiya meha Nîsanê de jî wan berhev dikin û li sûkan difiroşin. Bi vê yekê jî buhayên wan gelekî erzan dibin. Buhayê her kîloyek firingî ku gihîştibû 5 hezar lîreyên Sûriyeyê, niha bi 3 hezar û 500 lîreyan e. Kîloyeke xiyar ku berê bi zêdetirî 4 hezar lîreyan bû niha daket 2 hezar û 500 lîreyan.

Li gundewarê Dêrazorê şênî bi giranî debara xwe ji çandiniyê dikin. Bi dehan jin li gorî koman di nava baxçe û zeviyên sebezayan de kar dikin, sebezyan berhev dikin û dadixin sûkan.

Hemde El Xilêf destnîşan kir ku ew ji bilî berhevkirina berheman karê cotkirin û dermankirina zeviyan jî dikin. Hemde diyar kir ku ew rojane ji 6 heta 8 saetan di bin germahiya rojê de kar dikin.

Meryem Elî (26) sal bi sal sebzeyên ku ew berhev dike li sûkê difiroş e. Meryem Elî got, kalîteya sebzeyên ku difroşe baş e, ji ber vê yekê eleqeya şêniyan a ji bo kirînê gelekî baş e.

Li Reqayê, Komîteya Aborî ya Meclisa Sivîl a Reqayê dest bi berhevkirina sebzeyên projeya baxçeyên sergirtî kir ku bi rêya wê sûkên xwecih geş dike. Projeya baxçeyên sergirtî di Kanûna 2022'yan de hatibû avakirin û tê de sebzeyên cûrbecûr hatibûn çandin.

Komîteya Aborî hewl dide bi rêya projeya baxçeyên sergirtî rêgeza xwetêrkirinekê peyda bike û derfetên kar ji hejmareke mezin a karkeran re peyda dike.

Têkildarî vê mijarê, rêveberê projeya baxçeyên sergirtî ya Reqayê Hisên El Xilêfan got: "Di sala 2021'an de me dest bi projeya baxçeyên sergirtî kir. Îsal me hejmara baxçeyên sergirtî zêde kir ku bû 13 baxçe da ku cûreyên zêdetir tê de bên çandin."

El Xilêfan wiha domand: "Di dema niha de em nikarin bibêjin ku projeya baxçeyên sergirtî rêgeza xwetêrkirin peyda kiriye, lê belê ew armanca me ye. Em bang li cotkarên Reqayê dikin ku di zeviyên baxçeyên sergirtî ava bikin da ku em armanca xwe pêk bînin û sûkên herêmê bi berhemên xwecih geş bikin."

El Xilêfan destnîşan kir ku Komîteya Aborî amade ye ku destekê bide cotkarên ku dixwazin projeyên baxçeyên sergirtî vekin û pêdiviyên wan bi cih bîn e.

Der barê plansaziyên dema pêş jî de El Xilêfan got: "Em ê hejmara baxçeyên sergirtî zêde bikin û holên mezin ên firotina sebzeyan li Reqayê vekin da ku sebze di zivistanî de bi buhayê kêm werin firotin."



## Hilbijartin û oldar

**Hafiz Ahmet Turhalli**

Di 14'ê Gulanê li Tirkiyê û bakurê Kurdîstanê hilbijartinên Serokkomarî û Endamên parlemana Tirkiyê hene.

Bi taybet mirov kare bibêje ku ev zêdetirî bîst salane Kesên bi Rêberiya Erdogan li ser desthilatin, ji xwer dibêjin em Oldar û Misilman in. Ji ber vê, divê mirov di çarçoveya olî de pirsgirêkê bigre dest û bi awayeke zelal pênase bike. Gelo li gorî Ola Îslamê Hilbijartinên ji bo birêveberiyê hene an na? Gelo wek henekî dibêjin di Ola Îslamê de hilbijartin nînin, ev raste an na?

Li gor Pîvanên Qura'anê mijara birêvebirinê weha hatiye destnîşan kirin.

,Karê wan (bawermendan) bi îstîşarêye'. (Şura 38)

,Ey Muhemmed! Dema te dest bi karê birevebirinê kir bi (Sehabe Heval) ên xwere îstîşarê bike! Dema we biryar da xwe bispêre Xwedê'. (Alî Îmran 159)

,Hûn sê kes rêwîtiyêdebin, yekê ji xwere wek rêber hilbijêrin'.
(Ebu Dawud: Hijmar Hedîs 2242)

Ola Îslamê li gor Melîktî û Sultaniyê birêvebirinê napejirîne. Lê ji bo birêveberiyê henekî hîmên bingehîn datîne û pêşniyar dike.

a) Edalet: Dadmendî Ji bo her kesî bê cudabûn û bê navber pêkanîna dadê

b) Emanet: Hemû desthelat wek meqamên emanetê ku piştre radestî milet tê kirin.

c) Ehliyet- liyaqat: Mirov vê karî bide kesên ji heq derdikevin, ne kesên nezan.

d) Meşweret: Yanî bi hişmendiyek civakî û hevkar rêveberî were pêkanîn, ne wek şexs ku piştre bibe dîktator.

e) Heqqaniyet: Bê cudabûn hergav li cem heqîqetê cîh girtin.

f) Meslehet: Berjewendiyên Civakî, ne berjewendiyên takekesî

Di derbarê birêvebirinê de, Pîvan û prensîbên Qur'anî evin.

Mixabin ev pîvanên han piştî wefata Pêxember (sXl) bi zanebûn hatin şîlo kirin. Hişmendiya desthelatê di nava Misilmanande vegeriya ser pîvanên Sultaniyê. Birêveberî jî, ji bav derbasî lawan dihate kirin, wek Melîk û Şahan. Qur'an rêveberiya bi vî rengî red dike û napejirî ne.

Qur'an dibêje; Divê birêveberî bi hilbijartin û pejirandina civakî li gor wan pîvanên ku me rêz kirin pêkwer e.

Lê ev pîvan di dîroka me Misilmanan de pêk nehatin. Ji ber wê ne aliyên Şîî, an yê Sunnî ne li gor van pîvanan pêkahtine an jî pêk tên, berovajî li gor Kral û Sultanbûnê birêveberî pêk anîne û tînin.

Roja îro jî, di Şexsiyeta Erdogan heta hemû welatên ku hemwelatiyên wan Misilmanin bi heman hişmendiyan desthelat tên meşandin. Erdogan jî xwe wek Sultan dibîne û dibêje ez, La Yuselim', kes nikare ji min hesabê bipirs e. Ev hişmendiyek şaş e, mixabin bi navê Îslamê hatiye bi cîh kirin. Ji ber vê hişmendiyê Civaka me Misilmanan di pirsa birêvebirinê de têk çû ye. Kesê bi navê Îslamê dibe desthilatdar, dibe dîktator û di bengeha vê hişmendiyêde ev berovajî kirin heye.

Em dibînin, kuştin, dizî, maf xwarin, ruşwet, ne layiqbûn, nedurist bûn, di van birêveberiyan de pir pêşketî ye.

Dema pirsgirêka birêvebirinê bi vî rengî be, civak jî diçe fesadê.

Îro hilbijartin hene: Ger demoqrasî û dadmendî hebe, divê pêşbirk li gor wan pêk were. Hilbijartin di qada Tirkiyê de wek xapandin pêk tê.

Divê Misilman, ji van zaliman xwe azad bikin. Divê Kurd bi yek dengî dijî van dijminên xwe dengê xwe bikar bînin.

Divê kesê xwedî hiş û wicdan hemû derudorên xwe rêxistî bikin û bibin dengdanan.

Divê ev dijminên mirovahiyê bi tenê werin hiştin.

Dengê me kesayta me ye, kesayet nayê firotin.



# HDP: Di mehekê de 295 kes hatin binçavkirin


**Navenda nûçeyan**

**Hevberdevka Komîsyona Hiqûq û Mafên Mirovan a HDP'ê Nûray Ozdogan da zanîn ku di nava mehekê de 295 kes hatin binçavkirin û 61 kes hatin girtin.**

Hevberdevkê Komîsyona Hiqûq û Mafên Mirovan a Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) Nûray Ozdogan, têkildarî operasyonên binçavkirinê yên li Amed, Enqere û Stenbolê, li Navenda Giştî ya HDP'ê civîneke çapemeniyê lidar xist.

Ozdogan da zanîn ku desthilatdarî ji bilî xwe ji her kesî re dibêje "terorîst" û got: "Operasyonên li dijî partiya me û muxalifan hemûyan ên ku ji aliyê daraza û hiqûqa AKP'ê ve tên kirin, li ber hilbijartinê zêde dibin."

Ozdogan bal kişand ser bîlançoya meheke dawî ya binçavkirin û girtinan û wiha got: "Li dijî endam û rêvebrên partiya me, li dijî endam û rêveberên Partiya Çepên Kesk, li dijî endam û rêveberên DBP, li dijî ESP'ê, rojnamevan, hiqûqnas, hunermend, nûnerên rêxistinên sivîl di operasyonên hatin kirin de 295 kes hatine binçavkirin û ji wan 61 kes hatine girtin. Bi nêzîkbûna hilbijartinên 14'ê Gulanê re li dijî partiyên me, Kurdan û muxalîfan zext û zordarî zêde bûne. Bêguman sedemek viya heye, ew jî encamên rapirsiyan in. AKP ketiye nava tirs û xofê."




Ozdogan bal kişand ser gotinên Suleyman Soylû ku ji hilbijartinên 14'ê Gulanê re gotiye, "darbe" û wiha axivî: "Rayedarên AKP'ê dest bi gotinên ku ketine nav tirs û xofê kirine. Suleyman Soylû ku bi hezaran polîs, leşker û bekçiyan dide pişt xwe û hê jî Wezîrê Karên Navxweyî, hilbijartinên 14'ê Gulanê wek 'hewldana darbeyê' pênase kir. Ji bo ewlehiya hilbijartinê divê demildest dawî li wezîfeya Wezareta Karên Navxweyî ya Suleyman Soylû were anîn. Her ku hilbijartin nêz dibe gotinên nefretê û provokasyon zêdetir dibin. Desthilatdariya AKP-MHP'ê li dijî her kesî dijminatiyê daye destpêkirin. Wê ev lîstok û dijminatî di 14'ê Gulanê de bi dawî bibe û were xerakirin. Em li dijî provokasyonan bang li her kesî dikin ku hişyar bin û helwestê nîşan bidin."

# Li Efrînê guhertina demografîk

**Navenda nûçeyan**

**Dewleta Tirk a dagirker li nêzî navenda bajarê Efrînê bi piştgirî û fînanseya 'Komeleya Alîkarî û Pêşvebirinê ya Navneteweyî "Insur" mêtingeheke din ava kir.**

Dewleta Tirk a dagirker bi piştgirî û fînanseya komeleyên Îxwanî avakirina mêtingehan li gund û navçeyên kantona Efrînê ya dagirkirî dewam dike.

Qaşo "Meclisa Herêmî" ya girêdayî dewleta Tirk a dagirker li nêzî navenda bajarê Efrînê bi navê gundê "Emel 2" mêtingehek vekir. Mêtingeha nû bi piştgirî û fînanseya Komeleya Alîkarî û Pêşvebirinê ya Navneteweyî "Insur" hatiye avakirin.



Di mêtingeha nû de 500 xanî hene.

Dewleta dagirker di sala 2021`an de jî li gundê Kefer Kelbên ê Ezazê yê li bakurê Helebê ji bo bicihkirina malbatên çeteyan mêtingehek bi navê "Erd El Emel" çêkiribû. Ew mêtingeh bi piştgiriya Rêveberiya Rewşên Awarte ya Tirkiyeyê "AFAD" û 'Insur'ê hatibû avakirin.

Di 15'ê Mijdara 2018'an de çêkirina mêtingehan dest pê kir, wê demê li başûrê Efrînê mêtingehek bi navê "Qeriya Şamiyê" ya li gorî nave çeteyên "Cebhe Şamiyê" hat çêkirin.

Dewleta dagirker di 5 salên dagirkeriyê de zêdetirî 25 mêtingeh li Efrînê çêkirin. Dewleta dagirker bi wê yekê hewl dide demografiya herêmê biguherîne û wê ji axa Sûriyeyê qut bike, bi wê jî plana vegerandina sînorên Mîsaqî Millî pêk bîne.

# Penaberên li Lubnanê beyannameya Rêveberiya Xweser erênî nirxandin

**Navenda nûçeyan**

**Beyannameya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ji aliyê penaberên Sûriyeyê yên li Lubnanê ve bi dilxweşî hat pêşwazîkirin. Penaberan destnîşan kir ku beyanname îsbat dike Rêveberiya Xweser aliyekî nîştimanî ye û ji bo tevahî gelê Sûriyeyê dixebite.**



Di demekê de ku hejmareke dewlet hewl didin ku têkiliyên bi hikumeta Şamê re normalîze bike û hinek hêzên lubnanê hewl didin mijara penaberên Sûriyeyê bilivînin, Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê beyannameya çareseriyê pêşkêş kir. Rêveberiya Xweser diyar kir ku ew amade ye penaberan pêşwazî bike

Rêveberiya Xweser bang li Neteweyên Yekbûyî (NY) kir ku di vê pêvajoyê de navbeynkariyê bike, bibe garantor û kerîdorên mirovî ji bo derbaskirina penaberan veke.

Derbarê vê peyannameyê de hin penaberên Sûriyayê yên li Lubnanê ku ji ber rewşên ewlehiyê nexwestin navên xwe eşkere bikin, nêrînên xwe bi me re parve kirin. Penaberan ev beyanname bi dilxweşî pêşwazî kir û destnîşan kirin ku ev beyannameyeke mirovî û nîştîmanî ye.

Mistefa spasiya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê kir û destnîşan kir ku Rêveberiya Xweser tenê barê gelê Sûriyeyê bi hemû pêkhateyên xwe hildigire.

Penaberê bi navê Rakan diyar kir ku ev beyanname di demeke girîng de hat ragihandin ku penaberên Sûriyeyê yên Lubnanê gelek zehmetiyan dikişînin, nexasim piştî ku biryara derxistina wan ji Lubnanê hat dayîn.

Penaberê bi navê Ebû El Ebid got: "Gelo çima çapemeniya erebî û rojavayî bal nekişand ser vê beyannameyê? Ev beyanname nîşan dide ku ku Rêveberiya Xweser aliyeke niştîmanî ye. Her wiha îsbat dike ku gelê Sûriyeyê bi hemû beşên wî destekê dide hev."

Ebû El Ebid bang li NY û hikumeta Lubnanê kir ku vê beyannameyê cidî bigirin û kerîdorên mirovî ji bo wan vekin.

Penaberê bi navê Murad jî got: "Rêveberiya Xweser aliyeke nîştîmanî ye, hewl dide li gor derfetên xwe penaberên Sûriyeyê yên li Lubnanê pêşwazî bike. Em spasiya Rêveberiya Xweser dikin ji ber ku cudahiyê naxe navbera pêkhateyên gelê Sûriyeyê."

# Tevgera dîplomatîk a ji bo Sûriyeyê zêdetir dibe

**Navenda nûçeyan**

**Dewletên Ereban bi serkêşiya Erebistana Siûdî û Misrê ji aliyekî ve û ji aliyê din ve jî Rûsya, Îran û Tirkiye hewl didin serweriya xwe li ser Sûriyeyê pêk bînin lewre tevgerên dîplomasiyê zêdetir dikin.**

Komkara Erebî duh (5`ê Gulanê) ragihand ku dê roja yekşemê ji bo nîqaşkirina krîza Sûriyeyê bi serokatiya Misrê re civînek awarte li dar bixe.

Ev yek di demekê de pêk tê ku tevî Misir û Erebistana Siûdî hin dewletên Ereban têkiliyên bi hikumeta Şamê re vegerandin. Wezîrên karên derve yên wan dewletan di hefteyên dawîn de serdana Sûriyeyê kir. Wezîrê karên derve yê hikumeta Şamê Feysel Mîqdad jî di Nîsanê de piştî zêdetirî 10 salan, serdana Qahîre û Riyadê kiribû.

Ev hewldan piştî civîna 1`ê Gulanê ya li paytexta Urdinê Emanê pêk tên. Civîna li Emanê ji bo nîqaşkirina hin dosyayên ku di civîn û dan û standinên berê de hatibûn pêşkêşkirin, bi beşdariya wezîrên karên derve yê Sûriye, Siûdiyê, Urdin, Misir û Iraqê hatibû lidarxistin.

Komîteya Misir, Urdin, Siûdî, Iraq û Sûriyeyê di encama civîna şêwirê (14`ê Nîsanê li Cedayê) ya wezîrên karên derve yên dewletên Meclisa Hevkariyê ya Kendavê, Misir, Urdin û Iraqê de, hatibû avakirin.

Dê 19`ê Gulanê de li Siûdiyê lûtkeya erebî bê lidarxistin. Tê texmînkirin ku endamtiya Sûriyeyê ya Komkara Erebî rojeva sereke ya lûtkeyê be. Hin dewletên endam, bi taybetî Qeter, li dijî vegera Sûriyeyê li Komkara Erebî ne.

Wezîrê Karên Derve yê Urdinê Eymen Sefedî ji CNN`ê re axivî û diyar kir ku tê texmînkirin ku dengên endamên Komkara Erebî ji bo vegera Sûriyeyê têrê bikin.

Wezîrê Karên Derve yê Iraqê Ehmed Sehaf jî destnîşan kir ku Iraq hîna li ser helwesta xwe ya vegera Sûriyeyê li Komkara Erebî ye.

Wezîrê Karên Derve yê dewleta tirk a dagirker Mevlut Çavuşoglu jî got ew niyet dike di çarçoveya civîna çaralî ya li Moskovê ya der barê Sûriyeyê de, bi hempîşeyê xwe yê rûsî Sergey Lavrov re dan û standinan bike.

Çavuşoglu ragihandibû ku li gorî Enqereyê dê civîna Wezîrên Karên Derve yên Tirkiye, Sûriye, Rûsya û Îranê ya li Moskovê beriya



hilbijartinên li Tirkiyeyê li dar bikeve.

Beriya her du civînan, serokkomarê Îranê Îbrahîm Reîsî serdana xwe ya Sûriyeyê bi dawî kir.

Hikumeta Şamê û Îranê di ware çandinî, petrol, veguhestin, rêwîtiyên hewayî, bazirganiya serbest, peywendî, teknolojî, xizmetên bankan, xizmetên teknîk û endazyariyê de gelek lihevkirin îmze kirin.

# Şerê Gelê Şoreşgerî

Di pêvajoya heyî de, gelên Rojhilata Navîn û bi taybet gelên Kurdistanê di xeteriyeke mezin re derbas dibin. Hêzên desthilatdar ji bo parastina desthiltdariya xwe, planên qirkirina gelan pêş dixin. Li hemberî wê û ji bo têkbirina planên desthilatdaran, çareya yekê Şerê gelê Şoreşgerî ye.

**Mihemed Xanim/ Qamişlo**

Têgîna 'Şerê Gelê Şoreşgerî 'piştî şerê Çîn û Viyetnamê sala 1979 ket rojevê. Bingehê wê ji aliyê pêşengê çînî Maw Tisî Tong ve hat danîn û li cem alîgirên wî bû stratejî. Li derveyî Çînê jî li welatên weke Viyetnam, Kûba, Nepal, Cezayir û Nîkaragowa şerê gelê şoreşgerî bi ser ket. Di dawiya sedsala borî de, ev stratejî, bi saya raman û felsefeya Rêber Ocalan, li Kurdistanê jî hat bikaranîn. Di vê stratejiyê de yê şer dimeşîne gel bixwe ye. Tevî kêmbûna derfetan gel hewl dide xwe bigihîne armanca xwe azadiyê.

Di şerê gelê şoreşgerî de her pêkhateya civakê beşdar dibe. Ji bo serkeftina şoreşê, zarok, ciwan, jin heta kal û pîr; karker, endezyar, bijîşk, cotkar, hunermend, her yek ji wan li gorî derfetên xwe tevlî şer dibe. Bêguman ev jî bi pêşengiya şoreşgeran dibe. Şoreşger jî ew kes in ku bi welatê xwe ve girêdayî ne, ji bo parastina çand, rûmet û azadiya gelê xwe giyanê xwe feda dikin. Herwiha ji bo gihîştina armanca xwe bedelên giran didin û ji bo avakirina pergala parastinê bênavber û bê dudilî dixebitin.



### Dem dema Şerê Gelê Şoreşgerî ye

Yek ji prensîbên sereke yên Şerê Gelê Şoreşgerî girêdana bi axa welat ve ye. Rêber Apo li ser vê stratejiyê pir sekinî, lewra girêdana axê misogerkirina hebûnê ye. Herwiha perwerde û hişmendî perçeyên bingehî yên şerê şoreşgerî ne. Divê her kes bizane, eger em dijminê xwe nas nekin, emê nikaribin têk bibin.

Gelê Kurd bi sedê salan ji aliyê dagîrkeran ve hat kuştin, ziman û çanda wî hat qedexekirin û siyaseta bişaftinê li ser hat meşandin. Di encamê de hebûna wî ket xeterê. Li hemberî vê siyasetê li Kurdistanê gelek serhildan pêk hatin û li cem Kurdan hêviyeke mezin çêbû. Lê ji ber gelek sedeman tev jî şkestin. Bi şkestina serhildanan re çareke din ewrên reş û tarî li asîmanê Kurdistanê kom bûn. Vê rewşê heta sala 1978'an dewam kir.

### Ji bo Kurdan serdemeke nû

Sala 1978an li bajarê Amedê komek şoreşgerên Kurd kom bûn û kongreyek li dar xistin. Di vê kongreyê de Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK) hat dameziran-din û Abdulah Ocalan bû serokê wê. Bi vê pêngavê re baweriya Kurdan jinûve şîn bû û li derdora vê partiyê bûn xelek. Di nava demê de tekoşîna azadiyê gihîşt asteke bilind. Mirov dikare vê têkoşînê wek mînakeke şerê gelê şoreşgerî hesab bike. Bi demê re PKK li herêmê belav bû û li Rojhilata Navî bû hêza ronîkirinê ku ji prensîb û exlaqê xwe dûr neketiye. Eger di nava gelê Ereb, Faris û Tirk de partiyên şoreşger yên weke Partiya Karkerên Kurdistanê hebûna, Rojhilata Navî nediket vê çala tarî. PKK partiya şoreşger ya yekê bû ku di nava gel de stratijiya têkoşînê ya berfireh pêş xist. Rêber APO dibêje; eger hêza me ya têkbirina cîhanê tevê hebe jî emê êrîş nekin, lê eger cîhan tev bibe yek û êrişî me bike, emê li ber xwe bidin.

### Yek ji mînakên Şerê Gelê Şoreşgerî di Şoreşa Rojava de

Çeteyên DAIŞ'ê di 15'ê Îlona 2014'an de ji sê aliyan ve êrîşî bajarê Kobanê kirin. Çeteyan bi hişmendiya kuştin, talan û wêrankirinê bi hemû cureyên çek û cebilxaneyên giran yên ji dewleta Tirk a dagirker wergirtibûn êrîşî Kobanê kirin. Li hemberî hemû cure êrîşan Şervanên Yekîneyên Parastina Gel û Yekîneyên Parastina Jinê (YPJ/YPG), ku ciwanên Kurd ji her çar perçeyên Kurdistanê cihê xwe di nava refên berxwde de digirtin berxwedanek bêhempa dan meşandin. Di encama berxwedana meh û nîvekê de berxwedana şervanan di cîhanê de deng veda. Bi awayekî hevbeş di 1'ê Mijdara 2014'an de li sê aliyên Kurdistanê û 30 dewletên cîhanî çalakiyên piştgiriya berxwedana Kobanê dest pê kirin. Bi milyonan gel dirûşmên silavkirina berxwedana şervanan a li dijî çeteyên DAIŞ'ê bê navber berz dikirin û nîşaneyên serkeftinê bilind dikirin. Ev jî yek ji mînakên Şerê Gelê Şoreşgerî ye.

### Gerîla bi berxwedana xwe rûmeta gelekî diparêze

Niha li çiyayên azad yên ku di dîrokê de her tim gelê Kurd pişta xwe dayiyê, gerîlayên azadiya Kurdistanê di nava berxwedaneke mezin de ne. Li dijî dagîrkerî û faşîzmê şerê hebûnê dikin. Bi vê berxwedana xwe parastina rûmeta gelekî pêk tînin. Divê bi taybetî di vê pêvajoyê de berxwedana gerîla tenê nemîne. Gerîla li çiyayên azad li ber xwe dide û wê her tim jî li ber xwe bide. Di vê serdemê de tişta ku bibe serkeftin û şerê gelê şoreşgerî ye. Ji bo pêkanîna vî erkî em dikarin erkê xwe yê dîrokî pêk bînin. Bi vê hişmendî, bîr û baweriyê wê serkeftin bibe ya gelên azdîxwaz. Eger li Rojhilata Navî şerê gelê şoreşgerî pêş nekeve wê tarîtî bidome û bibe sedema felaketên mezin.

# Komîteya Ekolojiyê ya KCK'ê: Helwesta me ya hilbijartinê ji bo ekolojiyê ye

**Komîteya Ekolojiyê ya KCK'ê: "Di vê demê de divê em helwesta xwe ji bo demokrasî, ekolojî û azadiya jinê bi kar bînin."**

Komîteya Ekolojiyê ya KCK'ê têkildarî hilbijartinên 14'ê Gulanê yên li Bakurê Kurdistanê û Tirkiyeyê daxuyaniyeke nivîskî da.

Komîteya Ekolojiyê got, "Di pêvajoya hilbijartinê de hilweşandina ekolojiya Tirkiye û Kurdistanê didome. Faşîzma AKP-MHP'ê jîngehên xwezayî ji şîrketên enerjî û înşaetê re vekir û bi vê re talan jî zêde bû. Piştî erdheja 6'ê Sibatê, moloz jî li xwezayê rû kirin û ev qirkirin zêdetir dibe. Faşîzma AKP-MHP'ê bi talankirina xwezayê hewl dide butçeya şer û hilbijartina Kurdistanê bi dest bixe. Ji Cûdî heta Çiyayên Kazê, ji Îkizdere heta Akkûyû hemû erdnîgarî ji bo berjewendiya şîrketên enerjî û înşaatê yên çavbirçî hatiye pêşkêşkirin.

Di dema ku encamên felaketên Hîroşîma û Çernobîlê hê nehatiye jibîrkirin, zanyarên faşîzma AKP-MHP'ê û Pûtîn ku di vê pêvajoyê de yekane piştgirê wan e, tevî berxwedana domdar jî Santrala Termîkê ya Nukleerê ya Akkuyuyê wekî veberhênana hilbijartinê dixe meriyetê. Ji bo kareseta 'Çernobîl'ê ya li Behra Spî amadekarî tê kirin. Zanyar û tevgerên ekolojiyê diyar dikin ku qada Santrala Termîk a Nukleer a Akkûyûyê tevdigere û balê dikişînin ser vê rastiyê.



Her wiha her çendî faşîzma AKP-MHP'ê şerê qirkirinê yê ku li dijî gelê Kurdistanê da destpêkirin girantir bike jî, dewleta Tirk ji ber berxwedana gerîlayan encameke ku dixwest, bi dest nexist. Ji ber vê yekê jî dixwaze şerê xwe yê ku bi lêçûnên mezin, bêyî ku ti qanûn û rêgezek exlaqî nas bike, bi tinekirina tevahiya xwezaya welat bidomîne. Bi projeya rantê ku di bin navê "sîstema enerjiya rojê" de li erdnîgariya Kurdistanê pêş bixîne, çandinî û sewalkariyê diqedîne.

Di Konferansa Tevgerên Ekolojiyê de ya ku di 21'ê Çileya 2023'an de li Stenbolê hat lidarxistin de, ji ber ku ev rastî ji zû ve dihat dîtin, bi gotina "helwesta me ya hilbijartinê ji bo ekolojiyê ye" helwesteke hevpar hat diyarkirin.


Ji ber ku em di demeke wisa de ne ku, li hemberî qirkirina xwezayê, em ketine demeke wisa divê em vê biryara xwe di hilbijartinê de pêk bînin.

Di vê demê de divê em helwesta xwe ji bo demokrasî, ekolojî û azadiya jinê bi kar bînin.

Her wiha dem hatiye ku li dijî desthilatdariya faşîst, despotîk ku xweza û gelan îstîsmar dike, di nava gelên me de nîjadperestî, neteweperestî û çeteyan teşwîq dike û dixwaze bi serdestiyê hebûna xwe biparêze, li ser sindoqan îradeya azad û çanda demokratîk a gelên me were eşkerekirin.

Em jî wekî gotina Îbrahîm Orûç ê ku di sala 2011'an de di dema vetoyên hilbijartinê de ji aliyê polîsên AKP'ê hatibûn qetilkirin: 'Kevir ji AKP'ê re, deng ji Partiya Çepên Kesk re."

## Gelo R.Erdogan direve?



**Ahmet AKTAŞ**

Ji mêj ve tê gotin ku R.T.Erdogan, heke di hilbijartinan de bi ser nekeve, dibe ku bireve! Li ser vê dîtina pir şîrove jî hatin kirin.

Lê niha di rojnameyên bi nav û deng ên dewletên giregir û xwedêgiravî dostên R.T.Erdogan, vê dîtinê û pêşbîniyê derdixên pêş. Li gelek dewletên Ewrupa û bi giranî jî li DYEyê, êdî weke ku desteka wî birî bin, li dijî siyaset û kiryarên rêveberiya wî nivîsandin zêde kirine.

Weke mînak, li Inglistanê rojnameya The OBSERVER û The ECOMONIST, li DYEyê Rojnameya BLOOMBER û The Sunday TIMES û hwd.

Nivîskarê The Sunday TIMESê Louise Callaghan, pir zelal û berfireh li ser R.Erdogan bi neyînî nivîsandî yê.

Naveroka nivîsa wî wisa ye; heke di hilbijartinan de bi ser nekeve, ya wê encama hilbijartinan qebûl neke, an jî wê bireve derve. Ji bilî vêna çare jê re nemaye… û hwd.

Hilbet ji bo wî gelek senaryoyên din jî tên gotin. Weke ku wê di hilbijartinan de gelek lîskên teknoloji bi kar bîne û xwe serkeftî nîşan bide. Heke ku ev lîskên teknolojiya bilind a navdewletî jî bi kêrî wî nehat an neserifand, wê wextê "derbeyê çêdike"!

Jixwe nerîna ji bo "derbe"yê ne di cihê xwe de ye, ji ber ku jixwe wî ji mêj ve derbe kiriye û ew niha jî xwediyê wê derbeyê ye û dewam dike. Wê derbeya ku digot a FETO ye, lê ew li xwe mikur hat û got "ev ji me re xelata xwedê bû"!

Lê her cûre lîskên teknolojî dikare bi kar bîne. Belê heke dewletên ev proje dane destê wî, ji bo dewama rêveberiya wî, destûrê nedin û dîroka desthilatiya wî dirêj nekin, ew senaryoyên ji bo wî tên gotin nikarin pêkwer e. Ew wêrekî û cesareta ewqas mezin pêre nîne.

Belê ew gotina "ew ê bireve derve" ne dûrî aqila ye.

Lê ma gelo ti dîktatorên mîna wî û dostê wî li ti dewletan ma ye?

Qasî tê zanîn piştî Omer Beşîrê Sudanê, nuha Gannûşiyê Tûnisê jî hat girtin.

Bi tenê maye Putin. Lê ev jî, "heke dermanê Wî heba wê li serê xwe bida", wisa diyar e tu dermanê wî yê birînê Receb derman bike nîne.

Jixwe diviya bihata vekirina Santrala Nukleer a Akkuyu, nehat.

Nuha jî, ji ber civînên wan ên berê hemû pûç derketin îca Çavuşoglu, li dora civînên 4 aolî dizîvire, dibêje em ê di 10ê vê mehê de wezîrên derve kom bibin li Moskovayê.

Lê mirov bala xwe dide awir û axaftinên wî tu hêvî têde diyar nake.

Jixwe civînê li welatên dora wan, êdî bêyî beşdariyan Tirkiyê kom dibin, Mînak; civîna(1.5.2023) pênc qolî ya Siûdî, Urdun, Irak, Sûriyê û Misrê ya li Emmanê pêkhat.

R.Erdogan, ji bo xenimeta Sûdanê kom bike, bi hezaran kes kişand wira. Lê nuha şer gur bûye û xeter mezin bûye, îca heyiriye ka wê çawa wan kesan paş ve bikşîne.

Dibe ku ji heman xeterê mezintir were serê hêzên wî yên li xaka dagirker a Sûriyê û Rojava jî.

Ka gelo çarenûsa Receb û koma gunehkarên wî çawa dibe?



# Li hemberî vîna gel êrîş û dorpêç berdewam in

Ji 5 salan ve kiryarên dagirkriya Tirkiyê û dorpêça hikumeta Şamê li ser koçberên Efrînê li herêma Şehbayê nehatine rawestandin, armanca wan ji van polîtîkeyên derveyî pîvanîn mirovahiyê ew e ku îradeya berxwedanê ya gel têk bibin.

**Zana Roj/ Qamişlo**

Di encama pilaneke navnetewî de û ji bo dagikirina Efrînê, di 20 Çileya 2018 an de dagirkeriya Tirki bi hemû hêza xwe êrîşî bajarê Efrînê kir. Dewleta Tirk a dagirker bi hêza NATO'yê Efrîn kir hedef, di pêvajoya şer de tavahî rêûrêbazên qirkirinê li ser gel dan meşandin û di encamê de bi 100'an şervan, sivîl û zarok hatin şehîd xistin û kelek komkûjî pêk anîn. Gel û şervanên Efrînê di Berxwedana Serdemê de efsaneya berxwedaniyê li hember cîhanê dan nîşandan.



### Kiryarên dagirkeriyê nehatin rawestandin

Piştî 58 rojan ji têkoşîn, berxwedanî û lehengtiyê, di 18 ê Adara 2018 an de gelê Efrînê di bin darê zorê de terka axa Efrînê kir û berê xwe da herêma Şehbayê. Gelê Efrînê li herêma Şehbayê tevî kêmderfetiyan jiyaneke nû da afirandin. Ji bo vegera Efrînê biryara berxwedanî û têkoşînê dan. Kiryarên qirkirinê yên dagirkeriya Tirk tenê di pêvajoya Efrînê de nema, dewleta Tirk bi heman hovîtiyê êrîşên xwe li ser herêma Şehbayê berdewam kir. Dagirkeriya Tirkiyê di herêma Şehbayê bi dehan komkûjî pêkanîn, yek ji wan jî di derheqê zarokên Efrînê de li Bajaroka Til Rifetê komek zarok kir hedef û di encama wê de 8 zarokan û kalmêrekî şehîd ketin. Dewleta Tirk û çeteyên girêdayî wê rojane herêma Şehbayê, Til Rifet û gundewarên navçeya Şêrawa dike hedef. Rojane balafrên bê mirov li ser esîmanê herêmê digerin. Her wiha bi guleyan û obîsan herêmê bombebaran dike. Di encama van êrîşan de gelek zirarên madî û windahiyên giyanî çêdibin.

### Sekna gel siyaseta dijmin têk dibe

Siyaseta dijmin ya qirkirinê li ser gelê Efrînê ji tavahî aliyan ve berdewam e. Li aliyekî rojane herêm rastî êrîşên dagirkeriya Tirk tê. Herwiha li aliyê din jî, siyaseta hikumeta Şamê ya dorpêçê jî bi heman mabestê tê domandin. Hikumeta Şamê ji 5 salan ve siyaseta tengavkirina herêma Şehbayê di hemû aliyan de dide meşandin. Di encama dorpêçê de tavahî jiyana gel tê rawestandin û bandoreke mezin di aliyê jiyanê de dide avakirin. Hikumeta Şamê rê li pêşiya derbaskirina madeyên sotemeniyê digire, ev yek jî her car bi mehan dirêj dike, êdî tavahî jiyana gel û xebatên saziyan tên rawestandin. Qadên tenduristî, şeredarî, nan, av, elektirîk û çûnûhatine gel Jî tê rawestandin. Bê guman ev rewş bi xwe re gelek zehmetiyan tîn e. Lê belê tevî van zehmetiyan rêveberiya herêmê û gel bi îradeya berxwedaniyê li ber xwe didin û bi sekna xwe ya şoreşgerî pilanên dijmin ji her alî ve têk dibin.

### Bîlancoya meha Nîsana 2023

Li gorî ragihandina leşkerî di meha Nîsanê de bîlancoya êrîşên dagiekeriya Tirkiyê û çeteyên wê yên li ser Efrîn û herêma Şehbayê wiha bûn:

Di 9'ê Nîsana 2023'an de, gundê Birc Qasê bi 10 obîs hatiyetopbaran kirin.

Di 15'ê Nîsanê de gundê Bênê û Aqîbê bi 200 obîs û doçkahatiye topbaran kirin.

Di 16'ê Nîsanê de gundê Bêlûniyê , Balafirgeha Minxê , Eyn Deqinê , Bênê , Soxonekê , Aqîbê , Hirşa Soxonekî , Merenaz , Malkiyê, Şewerqa , Alqamiyê , Tat Meraş. Irşadiyê bi zêdetirî 700 obîs ,tang, hawan , doçka hatiye topbaran kirin.

Di 17'ê Nîsanê de gundê Bênê , Minxê , Aqîbê , Soxnekê , Hirşa Soxnekê , Malikiyê , Şewerqa , Tat meraş , Meyasê bi 74 obîs û hawan hatiye topbarna kirin.

Di 19'ê Nîsanê de gundê Başemirê bi 3'ê rokêtê obîsê hatiye tobaran kirin.

Di 20'ê Nîsanê de gundê Mezin û Kelutê bi 3'ê rokêtên obîsê hatiye topbaran kirin.

Di 29'ê Nîsanê de gundê Hirbilê û Balafirgeha Miniqê bi 4 rokêtên obîsê hatiye topbaran kirin.

# "Armanc Ji Dorpêçê Şkandina Îradeya Gelan E"

**Norşîn Sîno\Qamişlo**

**Endamê Meclisa Giştî ya Partiya Yekîtiya Demokratîk Mihemed Emîn Elîko diyar kir ku armanca Hikumeta Şamê ji dorpêça li ser Şehbayê şikandina îradeya gelê herêmê ye û got, divê gel , hiqûqnas û hemû kesên elaqedar dengê xwe bighînin Cîhanê da ku dorpêç bê şikandin.**

Norşîn Sîno\Qamişlo

Dema ku dewleta Tirk ya dagirker herêma Efrîn kir hedef, bi hezaran gelê Efrîn bi darê zorê koçberî herêma Şehba bûn. Hikumeta Şamê bi meşandina siyaseta xwe ya dorpêçê li ser gelê herêmê xwest ku îrade û berxwedaniya wan têk bibe.lê belê ev yek nebû .Lewra roj bi roj firqeya çaremîn ya girêdayî Hikumeta Şamê dorpêça li ser gelê herêmê girantir dike û derfet nade ku pêdiviyên xwejiyankirinê wek pêdiviyên tendrustiyê , Ard û sotemenî derbasî herêmê bibe. Derbarê dorpêça girankirî ya li ser herêma Şehba yê endamê Giştî yê Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) Mihemed Emîn Elîko ji rojnameya me re axivî.

### `Armanca Hikumeta Şamê şkandina îradeya gel e`

Endamê Meclisa giştî ya Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) Mihemed Emîn Elîko diyar kir ku Aarmanca Hikumeta Şamê ji dorpêça li ser Şehba şikandina îradeya gel e û wiha axivî: " Siyaseta Hikumeta



Şamê li ser gelê herêma Şehba ne ji niha ve ye. Ev 5 salin gelê Şehba li hember siyaseta wan ya qirêj li berxwe dide. Armanca wê jî şikandina îradeya gelê herêmê ye , Ji ber ku di texmîna wan de bi wergirtina pereyên zêde û nederbaskirina madeyên sotemeniyê yên ku bingeha jiyanê temsîl dike, ew ê karibin têkoşîn û berxwedana gel bişkînin , lê belê gelê Efrînê bi îsrarbûyîn li hember van siyasetan li berxwe dide û tavahî pilanên dijmin vala derdixin."

### `Dorpêç li ser jiyanana gel bandor dike`

Mihemed Emîn da zanîn ku dorpêçkirin roleke pir xirab di milê xizmetkirina Civakê de ji aliyê xwe Jiyankirinê de dilîze û wiha domand: "Di milê xwejiyankirina ji aliyê gel de dorpêç roleke pir xirab dilîze wek di milê tendrustiyê de pêdivî gelek kêm in bi taybet piştî erdhejê de, Firqeya çaremîn a girêdayî Hikumeta Şamê rê neda ku alîkariyên xwarin û vexwarin, her wiha derman, erebeyên alîkariyê derbasî herêmê bibin.Ev jî bandoreke neyînî li ser jiyana gelê herêmê kir."

### `Saziyên mirovî û navdewletî çavên xwe li ser van kiryaran girtiye`

Elîko di heman demê de balkişand ser rola Saziyên mirovî û navnetewî di rewşa ku tê jiyankirin de û wiha dirêjî da gotina xwe: "Saziyên mirovî û yên Navnetewî ji bo berdewamkirina berjewendityên xwe I herêmê, tu destwerdanênên cidî ji bo çareserkirinê nakin. Ev yek jî ji me re dide diyarkirin ku tavahî dewletên heyî li ser xwîna gel xwe didin mezin kirin "

### ` Divê gel , hiqûqnas û hemû kesên elaqedar dengê xwe bighînin Cîhanê`

Endamê Meclisa Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) Mihemed Emîn Elîko destnîşan kir ku divê gel , hiqûqnas û hemû kesên elaqedar dengê xwe bighînin Cîhanê û wiha axaftina xwe bidawî kir: "Ji bo têkbirina dorpêçê divê gel, hiqûqnas û hemû kesên elaqedar dengê xwe bighînin Cîhanê û bihêlin saziyên Navnetewî çavên xwe li ser kiryarên ku di derheqê gel de tê kirin vekin . Gerek herkes xwe li hember çareseriya aloziya Sûriyê berpirisyar bibîne. Di nêrîna min de ku ev tişt li kêleka berxwedaniyê û têkoşînê bê kirin wê dorpêç were şikandin û gel karibin bi aramî bijîn."

## FENER

## Niştimanperwerî, Piştgiriya Deklarasyona Rêveberiya Xweser E



**Idrîs HENAN**

Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê, di 18 Nîsana îsal de (2023), deklarasyona 9 xalan a ji bo çareserkirina aloziya Sûriyê bi raya giştî re parve kir. Di serê hemû xalan de, lêgerîna li çareseriya demokratîk ku bi kêrî hemû pêkhate û gelên Sûriyê werê, misogerkirina mafan, parastina pirrengiya Sûriyê û hevtemamkirina selikên aborî yê welêt, hebûn.

Piştî 12 salan ji aloziya Sûriyê, asêbûna siyasî û wendakirina pîvoneka çareseriya kirîzê, li gel hemû guherîn û veguherînên li herêmê û cîhanê rû didin, deklarasyona Rêveberiya Xweser di vê demjimêrê de, pêdiviyek dîrokî ji bo bidawîkirina êşa gelên Sûriyê, û pencereyeke rizgariyê ji bo hêzên navneteweyî yên bê proje, bû. Lew re jî, deklarasyona Rêveberiya Xweser bala her kesî li cîhanê kişande ser xwe. Hemû aliyan hewl dan sûdê jê bigirin û bi awayek ji awayan weke gaveke erînî hate nirxandin. Tenê kurtêlxwar û nûkerên li ser sifreya celadan nepixîne, ziman beden û naverok berovajî kirin ku qaşo, Rêveberiya Xweser ewqas pragmatîst e, xwestiyş sûdê ji heyama berhevhatina dewletên ereb bi Şamê re werbigire. Lê dîsa jî nekarîn li xwe mikur bên ku ew jî beşek sereke ya kûrkirina vê aloziya 12 salan in û li gel rejîma Sûriyê, herdû rûyên tabloya kirîza li welêt in. Bi gotinek din; eger xwedî projeyeke rizgarî û azadiyê bûna, wê bê dudilî modela çareseriya niştimanî ku Rêveberiya Xweser pêşkêş kiriye bi dilgermî pêşwazî kiribana.

Rêveberiya Xweser carek din, ji hemû dost û dijminan re isbat kir ku; modela wan a çareseriyê xwe dispêre rêgeza bingehîn a yekparebûna axa Sûriyê ya li ser bingeha edalet, wekhevî û pirrengiyê ye. Her wiha diyar bû ku çendîn prosesên perjewendiyên hinek aliyan li ser hesabê berjewendiya niştimanî diparêzin hebin, nikarin bê vîna li ser erdê ya ku temsîla cewherê şoreşa Sûriyê dike, ti prosêsan bi rê ve bibin ne jî dikarin bi ser kevin.

Aliyek din ê vê deklarasyonê jî ew e ku hembêza niştimanperwer a li Bakur û Rojhilatê Sûriyê mezin bûye, ji hemû penaberên Sûriyê re vekiriye û hemû tewanbariyên nijadperest vala derxistin. Çawa berê, îro jî Rêveberiya Xweser, tevî hemû êriş, zext, dorpêç û hewlên reşkirinê, bang li penaberên Sûriyê yên li Sûdan û Lubnanê kir ku berê xwe bidin Bakur û Rojhilatê Sûriyê. Yanê Rêveberiya Xweser roj bi roj isbat dike ku rêveberiya rasteqîn a xwedî projeya çareseriyê ya tekane ye. Derveyî vê beyannameyê jî ti niyetên rasteqîn ên çareseriyê nîn in.

Ezmûna Rêveberiya Xweser a birêvebirina herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê dide aşkartin ku paradîgmaya Rêveberiyên Xweser ên xwecihî yên pala xwe didin azadiya jinê û parastina ekolojiyê, şêwazê herî guncaw ê misogerkirina beşdarbûna hemû pêkhateyên Sûriyê nava birêvebirina welat de ye. Ev yek jî wê rê li ber beşdarbûn û parvekirinek adilane ya xêr û bêrên vî welatî li hemû gelên Sûriyê veke.

Ji bona ku bangewaziya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê jiyanî bibe, tenê yek şert û merc heye, ew jî têkbirina dagirkeriyên li Sûriyê ku di serê wan de jî faşîzma Tirk heye. Ast û cidiyeta nêzîkatiya ji deklarasyona Rêveberiya Xweser a çareserkirina aloziya Sûriyê re, wê niştimanperweriya her aliyekî diyar bike ka çiqas dilxwazê çareseriya vî welatî ye?.